
Terya kûçik





Anahita sîno

Di sala 1972 li bajarê Serê Kaniyê li Rojavayê Kurdistan ji dayik bûye .
Di sala 1988 dest bi nivîsandinê kir destpêka wê bi zimanê erebî bû hêdî hêdî bi zimanê dayikê nivîsand li kêlkeka zimanê Erebî.
Di wê demê Ew û hinek hevalên xwe wekî Dîlan şewqî ûTeymûr Evdikê û Mizgîn Tahir Dilşa Şêxanî û hinek
hevalên din komelek wêjeyî ava kirin bi navê (Ronak)piştre bû (Rewangeh)
Di vê komelê de kovarek bi navê(Babîsok) di sala 1994 derxistin
Anahita helbesta klasîk û ya nûjen dinivîsîne û gelek helbestên wê bi rengê sitranan tê.
Di hinek kovaran de û bi herdû zimana nivsand (Zanîn, Zevî, Rojda,Sorul,Almewasim,Zingil,Babîsok,.....)
Du pirtûkên wê hatine çapkirin (Hestên ji damarên Xabûr) helbestên kurdîne Di sala 2002 hate çapkirin Ya din bi zimanê Erebî ye bi navê(كتبت لاني احبك)
ewjî helbestin di 2018 hate çapkirin
Li kêleka helbestê Anahita Çîrok û Gotaran dinivîse

www.DEVKUP.com

AQIL MENDİ

Dı demê bûrî de û zemanê berê dı nav her êlekê de yekî şêwır mend hebû .

Wê êlê bı temamî şêwra xwe pê dıkırın û çı pırsgırêk derketa ewê bıçûba û çareserî jêra bı dîta .

heger ew şêwır mend (aqıl mend) pır jîrba jı cıhê dûrde dı hatın û wî dı bırın jı bo pırsgırêkên gıran çareser bıke .

Û zılamekî jı vî rengê han lı gundekî jıyan dıkır rojekê hate dawet kırın lı gundekî dın jı bona pırsgırêkekê çare ser bıike .

Sıbeh zû rabû cılên xwe lı xwekır û berî da wî gundî dı rêde û pıştî çend saat jı meşê pırr … hındık lı cotkarekî rast hat dı nav erdê xwede cot dıke.

pıştî ku sılav lê kır û bıhna xwe da ber xwe lê nerî û lı cotî wî narî û mıjûl ma û kete heyreke mezın rengê wî cotkarî nîşan dıde ku ew ınsanekî pîse (bê namûse)lı cotî wî nerî ku karî wî paqıje.

dı vır de dı xwede kete gûman û jı xwere got :dêmek ez xerıfî me û heger wılo be ez narım dawa xwe û ezê vegerım mal.

lê berî vê dıvê ku ez bıghêm baweryakî û ez vî ınsanî nasbıkım.

yê cot kar jî xêrhatına rêwıyê xwe kır ….av dayê û kurkê xwejêre raxıst û jêre got: lı ser rûnê mêvanê delal bê gûman tu westyayî.

dı vırde şêwırmend bêtır bêtır ket gûmanan û jı xwer got: vaye ev zılam başe çawa jı mın ve tê xwıya kırın ku ew pîse bı xwedê qey ez xerıfî me û ew aqıl gış wendabû .

Dı nav axftınê wande zılam jê pırsî :tu bı kude dehrî mêvanê hêja .

ezê herım fılan gundî îşekî mın lı wır heye .

weleh ew gund dûre û ez ne bawerım ku tu îro bıghê de ka îro were lı cem mın rakev û sıbe xwedê mezıne.

Yê şêwır mend qebûl kır û pêre çû malê û lı malê qedır û qîmet bê tır bû çı bı xwarına paqıj…çı bı peyvên xweş ….. Yê şêwır mend jı xwere got: xwedê zane sıbe vegerım mala xwe qet nema dıkevım pırsgırêkan pıştî ev

qedır qîmet û hîn jı mın ve tê xuyakırın ku ew bê namûse bı rastî jî ez xerıfî me .Lı ser van gûmanan yê şêwırmend kete xew,sbeh zû jı xew rabû..taştê hate berwî ...taşta xwe xwar ,çavê xwe gerand lı mazûbanê xwe lê nedî,bang lı xanıma malê kır û jêre got:xanıma hêja kanî mazûbanê mın ,ezê xatır jê bı xwazım û herım xanımê dengek ban zılamê xwe kır û got :flan kes vaye mêvanê me dıkê bı rê keve û wê xatır jı te bı xwaze,dengê mazûban jı nav erd hat û got :bıla here lê berî here bıla (5)wereqe deyne heqê xwarın û vexwarın û raketınê.

deng çû yê şawırmend û jı xanımêre got:jêre bêje heger pere tunebe bıla çıbıke dîsa xanımê bankır û got:fılan kes mêvanê te dıbêje heger pere bı mın re tunebe ezê çıbıkım dengê mazûdan hat :bıla kurkê xwe deyne û here dı vırde yê şêwır mend kurkê xwe jı xwe danî û bı bawerî berî da cıhê pırısgırêkê lı wî gundê dûr.



BAV Û KALÊ ME

Bav û kalê me dema behsa jiyana xwe dikin tim barkirin çêrandin,talan kirin di nava peyvên wan de cih digir tin û merov ji wan tê dighişt ku jiyana wan her dem bivî rengî bû ,raste di wê demê de jiyan bi vî rengî derbas dibû û çîroka me di wê demê de bû.Şêxo zilamekî navo sere bû lê zû zewcî bû û du xortên wî hebûn gîhabûn wî .

Şêxo xwedî dewar û hesp û konekî mezin bû.Û yên wilo di wê demê de dewlemend bûn.

Ji ber ku dewlemende gelek caran dihat talan kirin....lê tim zarokê wî talan vedgerandin.Rojekî Şêxo li pêşiya konê xwe rûniştibû dît yekî siwar ji wir de tê û berî daye wî, Şêxo ji berwî rabû..xêrhatina wî kir hespê wî girêda û çêrax jêre danî û rûniştin.

Ew siwar rêwî bû riya wî bi konê şêxo ket û ber êvare û weke adetê berê divê ew rêwî li cem Şêxo bimîne şîvê bixwe û rakeve ta sibe ronî bibe .Şêxo ji mîvanê xwere got :tu li ser çavê min hatiye ,bê giman tu birçî ye lê hebekî sebir bike wê niha zarokê min ji nêçîrê werin û çi bi xwere bînin wê şîva te be hîn peyva wî di devê wî de ye ,qher du lawên wî ji dûr ve xwanê kirin li ser du hespan û her yek xezalek di dest de li ba dibe.gîhan ber kon sılav kırın û herdû xezal dan jınan û gotın:şîva mêvanê me amade bıkın .

û hîn ew wılone êrîşek hate pezên wan û hatın talankırın.Herdu xort lı hespê xwe sıwar bûn û bı dû talanê xwe ketın û qerbalxek mezın kete nav wan .

Çûn û hatın ...birin û anîn... her du xort hatin kuştin ya talî Şêxo li ser hespê xwe siwar bû û Şêxo zilamekî ji xwe razî bû nehişt mêvanê wî jî dêkeve şer bi tena xwe çû talan vegerand û hat û meytê her du xortan anî .

Şêxo bi dengekî bilind bankir ka zû şîva mêvanê me çêkin .jin ketin tevgerekî bê tebat....paqijkirin.....çêkirin û li ber mêvanê xwe danîn.

Şêxo got:de êdî rabe şîva xwe bi xwe mêvanê delal.

yê mîvan matmayî ma?!!her du meyt li erdê û tiştê bi serê wan hat û hîn dibêje rabe şîva xwe bixwe.

Mêvan got: şîva çi ...halê çi ma tu bi aqilê xwe ye.

Şêxo:Erê erê ez bi aqilê xwe me rabe şîva xwe bixwe ji ber ku ezê alîkariyê ji te bixwazim.

Mêvanê feqîr ji mecbûrî du sê parî xist devê xwe lê parî di ber wî de narin piştî xilas kir rabûn herdu xort spartin axê.

Yê mêvan jiŞêxo re got: çi ji min tê xwestin ta ez karibim bi tere alîkarqbim.

Şêxo:jina minî biçûk xeyidiye li cem xwedyê xwe ye, bi hêvîme ku tu here wê ji min re vegerîne tevî min digot ez qet nema wê vedgerînim lê tişt nabe wilo tê xwestin.

mîvan: İşev??!!!

Şêxo: erê işev.

yê mêvan aqilê wî nema dikşîne ...halê wan...hewalê wan ,xortên hatin kuştin ,bav jina xwe ya biçûk dixwaze ka ev çiye? wer hasil ,yê mêvan mecbûr ma li hesê xwe siyarbû û çû mala xwediyê jina wî ...dan û standin...birin û anîn lê taliyê xwediyê jinê wê şandin .

di wê şevê de Şêxo konek xwe çûçik dûrî konê mezin vegirt û jina biçû li cem xwe de kir xew.

bû sibe taştê ji mêvan re danî, piştre yê mîvan xatir ji Şêxo û çû lê her tişt wekî xewnekê ber çavê wî derbas bû demek dirêj debas bû û dîsa qederê lîska xwe lîst ,û ew mêvan li ber konê Şêxo derbas dibe lê nizane ku Şêxoye ber êvarê dibî ku kalemêrek li ber konê xwe rûniştiye riya wî digre û dehre cem wî.

Dema nêzîk dibe nasdike ku ev kal şêxoye ku berî (20-22)salan berê bû mêvanê wî û ew şev dîsa wekî xewnek hat bîra wî ji ser hespa xwe peya bû û silavkir û Şêxo dîsa ji ber rabû di desbêkê de wî nasnekir ji ber ku çavên wî nema xweşik dibîne lê ji dengê wî ew naskir dîsa xêrhatina wî kir û jêre got: li ser çava tu hatiye mêvanê xweşewîst ez zanim tu birçiye lê sebir bike zarokê min çûne nêçîrê anha ewê werin û çi bînin wê şîva te be rast hinek man ,dît du xort ji wirde tên û nêçîra wan di destê wande li badide yê mêvan pirr matmayî ma,lê Şêxo bê dengiya wî şkand û jêre got

:Erê mêvanê delal heger min wê şevê bi ya we bikra tê iro li ber konekî wêran de as bibe.



Bê dengî

Berê karê bexçan pır bû û hemû kes têde dıxebıtî carna bexçe lı ber malê bû û gelek caran bexçe dûrî malêbû.

Rojekê qîz û xortek bûn heval dı rıyek dırêj de jı bo her yek jı wan here karê bexçê xwe bıke û dı navbera mal û bexçan de û lı ser rê hınek dar hebûn rê bı bê dengıyê dırêj dıbe lê yê xort ev bêdengî şıkand û jı keçıkê re got: tu dızanî anha emê bıghên nav dara.

Keçık: belê ez zanım.

Xort: tu dızanî wê bırayê te bê kuştın (keçık matmyî ma û lê nerî) yê xort temam kır û got: û bırayê mın jî wê bê kuştın.

Keçık lê vegerand :lê çıma?

Yê xort berdewam kır û got: û lawê apê te û lawê apê mın …. Lawê xalête û lawê xalêmın ….lawê metka te û lawê metka mın ….. lawê ….. ta gîha hemû xortên gund.

keçık mıjûl ma û lê vrgerand :û tu karî ev tışta gışî bısekınîne. Yê xort got: heger tu deng nekî ev tıştî gış çênabe….?!?....

[têbınî] Evjî rewşa mıletê mebû dıbın zexta desthılatdaran de yên ku dıbın vê durşmê de hukım dıkırın Yan bê dengî yan jî……???



Bê kar

Dı her wext û her zemanî de hınek bê havıl hene anjî kêm bextın û hınek jî bê karın û reşo yek jı wan kesan bû…… bê karbû û kêm bext bû .

rojekê jına wî jêre got :wılo nabe reşo ….. tıştek lı mal tune û tu ne kar û ne îş …teral…teral dıgere .

reşo lê vegerand: ma ka ezê çıbıkım keçê ez çı karî dıkım lı hev nayê û tu zanî tu sıneat dı destê mın de tune,de ka jı mır bêje qey ez nabım alım(zana).

Jın: hema bı xwedê vê carê te dı çavıyê de lêxıst Reşo Reşo:çavıya çı keçê
Jın: çıma tu nabî Alım.

Reşo: Alım îja keçê ma tu dîn bûye.

Jın: bı xwedê Reşo ev kar pır bı sûde ye.

Reşo: tu bı aqılê xwe ye ma ka ez çı şehrî zanım.

Jın: kuro ma derew bı pera ye ....derew merewa bıke û lı hev bîne ...ma te nego çıye xewna şırovebıke ...ber bejna çêke .... ezê alîkarıyê bı tere bıkım ,gotınek jı vır yek jı wır jınık reşo anî ser rê û rooj bı roj dı nav xelkê de hate belav kırın ku Reşo gotınên wî jı pelê quranêne û dı şırovkırına xewna de kesek naghê wî.

Rojekê paşayê wî bajarî xewnek dît ....zaneyên xwe lı dora xwe cıvand û xewna xwe jı wanre got : her yek wateyek da xewnê lê gış neketın serê wî lı talıyê ban xızmet karê xwe kır û jêre got: her ban reşo bıke ka ewê bê çı.

dema xeber gîha reşo .....reşo tev lı hev bû û jı jına xwere got: te çıkır bı serê mın te mala mın xera kır ka ezê çı bıkım û ezê çı bêjım.

Jın: tu here û ka bınêre xewna wî çıye?

Wer hasl Reşo berî da paşê û dılê wî gume gume û bı tırse û jı xwere dıbêje :bı xwedê Ijar kuştına mıne ka ezê çıbıkım.

Û hîn ew dı xem û xeyalan deye marek mezın lı pêşıyê derket...Reşo tırsıya û xwe da alî lê mar dîsa hat pêşıya wî û jı nışkave mar peyıvî û got: Reşo ez zanım çı bı te hatıye lê me tırse ezê bı tere alîkar bım.

Mar: Reşo:çawa: tê here cem paşê ewê jı tere bêje mın xewnek dî ku yên lı dora mın gış gurın tê jêre bêje wata vê xewnê ewe ku xelk gış bûne gur û her kes rehmê lı kes nake.

Û dı vegerê de tê rıya xwe bı mın xe Reşo û tê jı mın re bıbêje çı bı tere çêbû.Bı vî rengî soz dan hev û Reşo çû cem paşê û wekî mar jêre got: çêbû.

Bersıva wî jı bo wateya xewnê kete serê paşê û jı bo vêjî gelek pere dane Reşo.

Dı vegerê de dema Reşo mar lı pêşıya xwe dît kevırek rakır û avête mar û derbas bû.

Demek derbas bû dîs paşe xewnek dî û şand dû Reşo vê carê paşê dî bû ku her kes lı dora wî bıbû Rovî û ew dı nav deye. Reşo lı xwe heyırî...ka Ijar wê çı bêje...dîsa dı rê de mar jêre derket û jêre got: ewê paşê jı tere xewna xwe bêje û tê jêr bı bêj ku xelık hemû du rû bûne û xwedî dek û dolabın.

Lê dı vegerê de weke cara dın neke.?

Reşo çû û wekî mar jêre got wî jî jı paşê re got pır kêfa paşê jêre hat û vê carê pır pere dayê dı vegetê de jı xwere got heger ez rıya xwe bı mar xînım dıvê ez hınek pere bıdêmê hema weleh ez tew rıya xwe pê naxım.

Reşo rıya xwe guhert û çû malê...Lê jıyan berdewame û pıştî demekê dîs paşê ban Reşo kır.

Reşo jı xwere got:vê carê talıya mın hat ka ezê çıbıkım dı rêde dımeşe û bı xwere dı peyıve lê dîsa mar lı pêşıya wî derket û got: reşo paşê vê carê xewna berxıka dîtıye û tê jêre bıbêj ku rehım ketıye dılê xelkê û hınek wıjdan lı cem xelkê çêbûye.

û wılo reşo peyvên mar jı paşêre got û dîsa paşe kêfa wî hat û perakî pır da reşo dı vegerê de Reşo jı xwere got:dıvê Ijar ez rıya xwe bı vî marî xım wî çıqwas qencî bı mın kır û bı xwedê mın neheqîtî lê kır lı hember ev qencıyan ezê pere gışî bıdêmê hîn ew dı ramanan deye mar lı pêşıya wî derket.

mar: Reşo...çı bı tere çêbû ...tu pırr dıfıkırî.

Reşo:Marê delalî mın pır ne heqîtî lı te kır ez deyndarê teme û jı bo wılo jî ez lêborînê jı te dıxwazım û vaya pere gış bıla jı tere be.

Mar kenıya û jêre got:care yekem xelk gur bûn û jı bo wılo jî te kevırek avête mın,cara du yemîn xelk hemû Rovî bûn û jı bo wılo jî te rıya xwe guhert û vê carê xelk hemû berxık bûn û jı bo vê jî tu lı cemıne .... here Reşo xwedê bı tere be û bela pere gışî yên tebe.



ÇİRO Û PİRO

li rexê çiyayekî bilind bexçak hebû tije mêwe û fêkî bû him jî mirîşk,kevok.....têde xwedî dibûn hirç,kûçik,rêvî û cinawirên ji çiya dadiketin.

Carekê xwediyê bexçê dehfek danî û dihndur dehfê goştekî pir danî.

Berbange hîn xunav li ser pelê daran dibriqîn,rêviyek weke her roj riya wî bi wî bexçeyî ket ,dîna ku dî goştek li ber çavê wî ket,hema berî da wî û çû....dema gîhayê rêvî bi deke,zû aqilê wî dikşîne naskir ku ev fene û bi xwere dibêje eger ne fene ,lê ev çi bene.

Lê di eynê demê de dixwaze ew goşt bibe para wî di serêxwe de bir û anî... bir û anî dawiyê giha biryarekê û bi lez reviya piştî demekê kin , rêvî vegerya bi hevatiya şêrekî re dest dirêjî goşt dike û jêre di bêje rêvî ewaye goşt ...ma min ji tere ne got hevalê delal gostekî pir bi dest me ketiye û ji bo min pire.

Yekemîn tu ke t hizra min,ji ber ku tu hevalê hevalê xwe ye min ji xwe re got: bi xwedê ji pêv hevalkê minî şêr kes nêzîk nabe şêrê belengaz yek nekir dudu hema xwe çankir goşt û bi vî rengî kete dehfê û ben li wî gerya xelasiya xwe nema dî di vê demê de rêvî dada goşt û xwe da alî , şêrê reben naskir ku revî bi wî dikeniya lê tiştê çû nede dû şêr bang li rêví kir û got:te bi hêsanî min xistiye vê dehfê lê tiştekî meraq dikim ku ji te bipirsim berî tu here..ka bêje min navê te çî ye? Rovî : çiroye.

Hîn şêr di ramanan deye ku çawa rêvî wî xistiye vî halî mişkek li ber çavê wî ket mişk dî ku şêr ketiye halekî xirab, jê pirsî çi bi te hatiye şêro ?şêro ma tu dibînî çi bi halê min hatiye

mişk :ma Ez te ji vî halî xilas bikim?

şêro :Ez bi xurt bûnaxwe nikarim xwe xelas bikim tu feqîrê xwedê tê çi bikî.

mişk:İş ne bi mezinbûn û çûkbûnê ye şêro,!şêro kenya û got:de ka wê çi ji destê te derkeve hema mişk hat ben..hêdî..bi diranê xwe yê hûr ew ben ji hev xist û şêr ji dehfê xilas kir.

di kî xatir bixwaze û bimeşe lê şêro jêre got:ez pir spasiya te dikim lê berî tu here tu ji min re nabê navê te çiye mişk got :piro ye şêr hêdî hêdî ji bexçe dûrket lê rêvî li dû ban kir tu bi kude dehî şêrê delalî...ev cî pir xweşe û her tişt têde heye şêr lê vegerand cihê ku çiro min bigre û piro min veke ji min re tew nelazime



KûÇİK Û GUR

Li gundekî çiyayî bi xwezaya xwe tê naskirin av û dar ...li alîkî çiya û newal.....li alîk î her tişt li wî gundî zindî bû di nava van dîmenên xweş û geş qesrek xweşik hebû ,xwediyê qesrê pirr dewlemend bû ((yek ji yekî re bêj tu di qesrekê de ye))ya giring,her tişt di wê qesrê de hebû û xwediyê qesrê zilamekî pirr comerd bû , kûçikek wî zilamî hebû,pirr ji kûçikê xwe hezdikir û pir lê miqayt bû .

Li şûştina wî li cihê wî,li xwarin û vexwarina wî.....çi xwarnek xweş hebe nesîbê vî kûçikî têde hebû û ji ber vê yekê ji her ku diçû mezin û qelew dibû û wilo jî xweşik dibû.carekê kuçik ji xwere derket seyranê,li aliyê çiyê lê vê carê hinekî dûrket,hêdî....hêdî di meşiya li dora xwe di nêrî û hîn ew wilo bû li hember xwe kuçikek wek xwe dît ,lê ev kuçik pir lewaz û siste tevde bûye çerm û hestî bê hêl maye xwanê bû ku ji zû de xwarin bi devî wî nebû bû kuçikê qelew jêre got:çi hatiye serê te hevalê delalî? çima tu wilo bê hêl tu dibê qey tu ji gorê derketiye heger kuçik giş wa bin me mala xwe avakir yê bê hêl:ez ne kuçikim hevalê delal Ez gurim.!

kuçik :tu gurî..?bi xwe min bi te dernexist tê li min bibure lê çima tu ketiye vê rewşê

gur:Ezê çi bikim Ez çûme ku derê tiştek bi dest min ne ketiye û her tim bera min dane lewra ez ketime vî halî

kuçik:tu çima nayê cem min ez û te emê bi hevre bin bixwin,vexwin,rakevin her tişt li ceme heye ...goşt ....xwarin û xwediyê min pir comer de gur:tu bi rastî dibêjî..?

kuçik:erê were cem me ma tu halê xwe nabînî?

gur:temam hevalê hêja de ka em herin cem te ji ber ku Ez ji birçînan mirime .

wer hasil bi hev re tên qesrê rast weke kûçik gotiye her tişt heye,hema gur kete ser xwarnê û xwar...piştre bi hev re man ta bû êvar xwediyê qesrê ban kûçikê xwe kir û niqrek xist stuwê wî de û çû.

Gur hat cem wî û jê pirsî ev çi di stuyê tede ye..?

kuçik:ev toqa mine her roj xwedyê qesrê dixe stuyê min ji bo ez ji vir nerim.Di vir gur xatir ji hevalê xwe xwest ,û nêt kir ku dîsa derkeve ser çiya. kûçik jê pirsî :çima hevalê delalî li cem min be tê here ku...?

tê wilo ji birçîna bimre Gur:tiştê ez hisdikim tu hisnakî hevalê delal bila Ez birçiyê Azad bim û ne têrê bi qeyd û merbend bim.



mêvan û hersê Şîret

Hebû tunebû dılovanî lı canê dê û bavê mın û webû.
Rojekê lı gundekî yek lı yekî bû mêvan û berê mêvanên bıyanî Pırr bûn jı ber ku xelk bı meşê dıçûn û dıhatın û rê lı wan dırêj Dıbû û ber êvarê bıghana kîjan gundî lı wî gundî dıbûn mêvan Û wekî her mazûbanekî xwedıyê malê bı erkê mêvantıyê rabû Çı jı alî xwarınê ba ….

Çı jı alıyê dan û stendınê ba û çı jı alıyê Qedr û qîmetê ba….,bı vî rengî ta lı wan bû êvar û dı vırde Mêvan jı mazûbanê xwe re got kanî em herın odê û şevbuhêrka Xwe lı wır bıkın yê mazûban got :ode ya bırayê mıne û ez kêm Kêm dehım wır jı ber ku kesên tên odê ne kesên wekî mın Normalın hın jı wan xwedî aqılın û hın jı wan xwedî zımanın Û hın jıî xwedî fen û fûtın û jı ber vê yekê Ez kêm dehrım. yê mêvan bersıv da û got :de ka meş lo ma emê lı malê çıbıkın?dı bın zexte mêvan de mazûban mecbûr bû ku daxwazıya wî bı cî bîne lê şert û mercên wî hebû jêre got:mêvanê delalî emê herın lê ezê sê şîretan lı te bıkım û tê soz bıdımın ku tê bi ya mın bıkî

mêvan:temam wek tu dıxwazî

mazûban:yekemîn cıhê ne cıhê tebe lê rûnen mîvan:Erê yaw...ez zanım
mazûban:du yemîn peyvê ne peyvê tebe ne bêje

mêvan:weleh Ez vêjî zanım mazûban:sêyemîn tıştê jı te neye xwestın neke ev her sê şîretê mınin tu razye belê...belê ma ez bıçûkım berê ez ev tıştana zanım.

lê ser vî bıngehî herdû çûn sılav kırın jı ber wan rabûn yê mêvan çû dı sıngê de rûnışt lı kêleka mîr û paşa yê mazûban dı dılê xwe de got:ya yekemîn lı ber lınga çû. peyv çêbû yê mîvan xwe avêt nava peyvê lê yê kêleka wî wî bı peyvan xıst û yê mêvan dest bı sûnd û topa kır û yê dora wî gış pê kenıyan. mazûban got:ya dıdwa jî çû şev derbas bû yê paşê ban xızmet karê xwe kır û jêre got: ka zebeşek mezın bîne emê bışkînın zebeş anî paşê got: ka kêrekê bıdın mın yê mêvan berî her kes kêra xwe jı ber xwe derxıt û da paşê dema çavê paşê lı kêrê ket û bı xwe entîkeye gış bı neqşe paşe ban (karbengê) xwe kır û kêr nîşanî wî kır û got:ne kêra ku jı xezîna me hate dızîn karbeng wî got:belê paşayê mın ew bı xweye yê mazûban bı dılê xwe gırt ...lê paşa jı zılamê xwere got: wî bıgrın ew

dızekê xezîna meye û bıla sıbê yê qadî kuştın lê bıbıre dı vır de yê mazûban xwe avêt ber mêvanê xwe û got:ev mêvanê mıne Ez wî nadım we ta ışev lı çem mın rakeve û sıbe dema (dadgehê) Ezê wî bînım. wer hısal,mazûban lı ber wî da û nehîşt wî wê şevê bıbın lê yê paşê bırayê xwe nasdıke û jı ber vêjî soz jê bır ku bı mêvanê xwe re yek car nepeyıve her dû çûn malê lê mazûban lı ser agıre çawa wê mêvanê xwe jı nav vê belayê xelaske nemaze wî soz daye ku yek car pêre nepeyıve gelek mıjûl ma ta talıyê gîha encamekî dı wê şevê de çû kerek û qamçıyek anî lı ber mêvanê xwe gırêda û got:kero te bı yamın nekır te dî tu ket çı halî lêxıst û got:kero sıbê kûştın lı pêşıya teye jı mın fêmbıke Ezê çı jı tere bêjım û bıya xwe neke kero sıbê nehêle qadî pırsa bike berî ew bıke tu pırsa jê bıke kero wek Ezê jı tere bêjım tu bıke...jı mın fêmke jı qadî bıpırse û bêje:ka sedema hatına mın çıbû ev kêrê kêye û çıma mın wılo derxıst ewê jı te bıbêje çıma:tê bıbêjî sedema hatına mın ev kêre?jı ber ku bavêmın pê hat kûştın û lı ber serî wî ketı bû û ıro mın xwedıyê kêrê naskır û ez mafê xwe dı xwazım,te fêmkır kero,nebêje Ez zanım wekî cara berê .....
em dırêj nakın lê bı vî rengî mazûban mêvanê xwe jı kuştınê xelas kır bê ku soza xwe bıxwe.



PALEYA BÊ

Di dîrokê de hatiye gotin ku qiralek bi nav û deng hebû,ev qiral pir ji xwe hezdikir (hezkiriyê xwe bû)û ne dixwest kes ji wî çêtir be an zane tir be û ji bo vê yekê û bi alîkariya hinekan û ji bo tim qiral bimîne destûrek li nav miletê xwe derxist têde dibêje((her kesê temen mezin bê kuştin)) bı vi rengî ewê jı hemû kesên bı aqıl û her kesên zane xelas bıbe û îdî ewê tenê aqıl mendê vî bajarî be û dı heman demê de qıralê wê be.

lı ser vî bıngehî çı kesê bı temen mezın hatın kuştın, lê xortekî bavê xwe veşart û qêmîşê wî nekir ku wî bide ber kuştinê piştî demekê û ji bo qiral nasbike ku hemû kesên mezin hatin kuştin ((biryara karekê derxist))û ji hemû xortan xwest ku herin paleyê Lê paleya çi?

paleya bayê!!!her roj van xortan derdiketin û di vala bûnekê de destê xwe dibin û tînin û wekê bê bê diçnin û ketine wê bawerî ku paleyê dikin.

û dı vê tevgerê de dıwestın û dı talıya rojê de têne mal û jı hal ketıne wılo serê xwe datînın û radıkevın. Rojekê kale pîrê ku lawê wî ,wî veşartıbû jı lawê xwe pırsî û got: lawê mın hûn her rojê dıçın ku hûn ewqas dıwestın.

Law:em dehrın paleyê bavo.

Bav:paleya çı kurê mın dı vê demê de.

Law:paleya bê

Bav: nızanım guhê mın gıran bûye mın nebhîst Law:paleya bê bavo.

Bav: ma kî dehre paleya bê

Law: hemû xortên vî bajarî em gış dehrın.

Bav:de bıbhîze kurê mın Ezê çı jı tere bêjım.

Sıbehê heger tu çû paleyê Dasa xwe bavêje pıyê xwe û destê xwe dırêj bıke û wekî tu çımılekî jêke û têxe nav herdû destê xwe û herdû destê xwe bı hev bıde wekî tu bıfırkîne û talıyê bavê devê xwe, û heger jı te pırsîn tu çı dıxwe bıbêj :tıştê Ez paleya wê dıkım Ez dıxwım.

Bû roja dın dîsa xort hemû derketın paleyê,ew xort ê ku bavê wî wî şîret kır şîreta bavê wî hate bîra wî,Dasa xwe danî û çımılek jı bê jê kır û dı nav

destê xwe de fırkand û avête devê xwe. Çawîşê karkıran wî dît û bı lez hate cem wî û jê pırsî.

Ma tu çı dıxwî? Yê xort lê vegerand û got: tıştê Ez paleya wê dıkım Ez wê dıxwım.

Ev dîmen gîha qıralê bajêr û wî nas kır ku kesekî mezın lı dû vî xortî heye û bı lez ferman da ku ev xort lı cem wî hazır be. Dema xort hate hızûra wî qıral jê pırsî Qıral: bê gûman bavê te saxe ?!

Xort: çıma tu wa dıbêje mîrê mın?

Qıral: jı ber ku tıştê te lı paleyê kır ne lı gor aqılê teye.

Dı bın zexta qıral deyê xort lı xwe mıkur hat û got :belê qıralê mın tu rast dıbêje bavê mın hîn saxe û mın qêmîşî bavê xwe ne kır ku Ez wî bıdım kuştın.

di vir de yê qiral leşkerê wxe şand ew kale pîr anîn ji bo wî jî bikûjin.

Lê kalepîr ji qiral re got:berî tu min bikuje Ezê çîrokek ji tere bibêjim heger tu destûrê bide min qiralê min û pişti wê jî tu çibikî bike.

ye qiral got:ka de bêje çi li cem te heye ji berê da yên tên kuştin daxwazî ya wan ya talî bicîtînin de ka bêje ..... kalepîr got:di demê borî de qiralek wek te hebû û li dora wî gelek zana û şêwir mend hebû û ev sedema xurtbûna wî bû weke hevalê wî jî pir bûn dijminên wî jî pir bûn lê pê nikarî bûn û ji bo vê yekê bi siyaset bi dorê ketin û di riya hinekan re wî fêmkirin dan ku kesên li dora wî bi taybet yên şêwirmend ewên wî ji qiraltiyê bixînin û divê bi lez ji wan xilas be.

((Yê dijmin bi vî rengî tenê ewê karibe xurtbûna wî bişkîne)) qiralê reben kete bin bandora van peyvan û di cî de fermana şêwir mend derxiet lê bi çi rengî karikek anî û ji her şêwirmendekî dipirsî ev çiye kare yan xezale?

Heger bigotana kare dihatin kuştin , heger bi gotana xezale dihat kuştin .

Bi vê rengê han qiral pir şêwir mendê xwe kuştin da û hîn berdewame lê berê bighê talî yekê pir zana û bi aqil hebû û dema je pirsî -ev kere yan xezale ?

got:eger Ez bêjm kare ne kare eger Ez bêjim xezale ne xezale ev xezebe xwedê wî ji mere şandiye û wê taliya bajarê me bîne û bin dest xîne kalepîr ev çîroka min bû mîrê min İdî tu dikarî min bukûjî di virde yê qiral

wekî miriyê ku serî li kevirê gorê keve nuh li xwe hay bû û naskir ku çi anî serê xwe û çi dekû dolab li dora wî digere.



şêxê bi xılxal

Bazirganekî dewlemend û jina xwe li bajarekî jiyan dikirin .

Ev bazirgan pir li mala xwe miqaytebû û zilamekî pir camêr bû. Rojek vegeriya mal dî ku jina wî xwe nuxamtiye zilamê wê jê pirsî :cima ewqas te xwe nuxamtiye Û lı dora te hemû gırtye ?

Jına wî lê vegerand û got: Ev dara ku dı orta hewşêde çıvîkên nêr tên ser û jı ber vê mın xwe nuxamtıye. Yê bazırgan dı dılê xwe de got: başe ku ev jın bûye nesîbê mın, dêmek ew gelekî oldare û jı xwedê dıtırse.

Ta rojekê yê bazırgan jı karê xwe vegerıya û bıbû çend roj nehatıbû malê û hat , dîna ku dî ku jına wî bı yare û yarê wê dı cem wê de ye.

Dı wê kêlîkêde çıvîkên nêr hate bîra wî û naskır ku ew çıqwas kêm aqıl bû, xwe negırt rabû jına xwe kuşt û jı wî bajarî revıya û çû bajarkî dûr û mezın. Cıhê xwe dı wî bajarî de gırt ,Ew bajar pır aram bû tu pırsgırêkê wê awle karî tune bû jı ber ku mîrê wî bajarî gelekî baş bû û lı bajarê xwe xwedî derketıbû. Dı wî bajarî de şêxek gelkî bı nav û deng hebû û mırîdên wî pır bûn û navê wî şêxê bı xılxal bû. Dema ku dı tarekê de dımeşya te dıgo padîşahe û dımeş, xwedî rêz û hırmet bû.

Yê bazrgan Rojekê çav lı vî şêxî ket û xılxal dı lıngê wî deye jı xelkê pırsî:gelo çıma ev şêx xılxalan dıxe lıngê xwe, xelkê jêre got: morî gêrıkê lı erdê xew bıdın alî û pêle wan neke,hınkî jı xwedê bı tırse.

Û wılo roj derbas dıbû ta rojekê dızıyek mezın lı wî bajarî çêbû,yê mîr kır û nekır ku nas bıke yê dızek kıye lê bê sûde bû ,pır zehmet û dıjwar bû,ne tıştek ketıye bajêr û ne jî jê derketıye…..wılo ev dızî bê bersıv ma,lê yê bazırgan pır dı serê xwe de bır û anî lı talıyê çû cem mîr û jêre got : Mîrê mın ez zanım kê ev dızıya kırıye.

Mîr :çawa ……kıye ……..bı çı rengî?

Bazırgan:tu çend zılaman bıde mın û pıştî çend rojan tê her tıştî nasbıke.

Yê mîr çend zılamê xwe da yê bazırgan û ma. lı vır ye bazırgan lı şêxê bı xılxal kete gımanan û bû çavdêrıya wî dıke ew û zılamê bı wîre kî dehre û kî tê û dıçın ku û çı dıkın …her wıha ta gîha encamekî û çû cem mîr û got:mın naskır dızê te kıye mîrê mın.

mîr: kî ye?bazır gan şêxê te yê bı xılxale mîr çawa…..tu çı dıbêjî….!!!!! Bazırgan wekî ez jı te re dıbêjım û jêre şırove kır ku çawa mırîdê wi dızîn û xıstın enbaran û dı rıya wan re jî û jı ber ku mırîdên wî pırın û dı hemû derê de ne….jı enbara derxıstın û lı sûkê fırotın û wılo ne tıştek ket bajêr û ne jı bajêr derket bı vî rengî şêxê bı xılxal û çıvkên nêr bûn bersıva tıştên gelekî pîs û xerab û dı vır de tenê tıştek tê gotın ku tışt ne bı rengê xweyî derve ye.



ŞÊXMÛS

Şêxmûs zilamekî bê kar bû tu kar di destê wî de tune bû,li xwe û li pariyê zarokê xwe heyirî mabû .

Rojekê ji jina xwere

got :keçê piştî vî temenî ez nikarim fêrî tu karî bibim ji pêyv meletiyê, ya baş Ez herim ber destê melakî û fêrî îlmê quraanê û sunetê bibim ,him paqij û him bi hirmete.

Jinê got: Ê tu zane şêxmûs ,ya giring tu karibe me xwedî bike tu çi karî dike bike.

Weleh şêxmûsê min û we yek nekir dudo û çû ber destê mele û fêrî quran û sinetê bibe .

salekê du sal bi vî rengî derbas bû ,û şêxmûs fêrî her karê baş û paqıj bû , naskır ku çawa dıkarı fıtwa bıde lı gor şerîetê û çawa berbejan çêke ji Ayetê quraanê bı temamî ezber kır gîha astekê ku îdî dıkare xwe bı rê bıbe.

Sıpasya melayê xwe kır û jêre

got: mala te ava mamoste yê mınî hêja ,Ezê her bımînım deyındarê te .
Mele : (ıstexfır û lah) wılo nebêje ,Em gış deyndarê xwedê ne lê şêxmûsê delalî zanyarıya te hîn temam nebûye ku tu karıbî dı nav cıvakê de kar bıkî

Şêxmûs:çima melayê min

Mele:tiştê tu fêrbûye ew îlmê rehmaniye û hîn îlmê şeytanî jî heye.

Şêxmûs:Ezê çibikim bi îlmê şeytanî mele , îlmê rehmanî tenê besî mine.

MELE:tu zanî lê ez bawerim ku tê li min vegere sêxmûs.

Wer hasil mele û Şêxmûs xatir ji hev xwestin û mele Şêxmûs xwe berda nava civakê û dike dest bi karê xwe bike.Roj înî bû ,Şêxmûs çû mizgeftê limêj bike û xitba înê guhdar bike,di nav xelkê de rûnişt û guhdarî melê wê mizgeftê kir mele pir (çêçik bû) xwedî dek û dolab bû lê xelk bi xwe ve girêda bû.Derket ber xelkê û dest bi xitba înyê kir,peyvek ji vir yek ji wir

çi rast û çi derew ,Şêxmûs pir bi hêrs bû ji derewên wî melayî û xwe nema girt rabû û

got :gelê hazir ev mele derwa dike tiştê dibe ne raste di şerîetê de tuneye.

dema xelk ev gotin di derheqê mele de bihîstin hema giş rabûn û êrîşî Şêxmûs kirin û wî ji eyarekî xistin eyarek din.

Şêxmûsê reben (polî poşman) dil bi kul û can birîn vegerıya cem mamostayê xwey mele mele jêre.

got:çi hatiye halê te Şêxmûs kê li te wa kiriye Şêxmûs:hal hewalê min ji vir hey vire melayê min , min rast got û wilo bû bi serê min.

Mele: Ê min ji te re got Şêxmûs tê dîs li min vegerî de rûnê Ezê çi jitere bibêjim.

Mele şagirtê xwe fêrî îlmê şeytanî kir û jêre got çawa wê karibe xwe bi xelkê bide qebûl kirin.

bi vî rengî Şêxmûs her du beşên îlmên xwe temam kir,dîsa xatir ji melayê xwe xwest û çû vê carê mele

got:xwedê bi tere be şêxmûs idî tu dikarî cilka xwe ji avê derxînî,Şêxmûs dîsa di roja İnyê de çû wê mizgeftê û dîsa ew mele bû xwediyê dek û dolaban vê carê melê mizgeftê sûretê çêlekê bi xwere anî bû rabû ser xwe û ew sûret rakir û

)xelk hemû bi سورة البقرةgot:ev sûreta ku di quranê de hatiye bi navê (şewq û heyecan li mele dinêrîn û tevan ji wî bawer kirin ji nîşkave Şêxmûs rabû û ji xekê re

got:gelê dîndarê hêja bi xwedê ev mele pir qenc û başe û xwedê pir jê hezdike qey min do xewna wî dît di xewnê de dengek ji ezmana ji min re got ku ev insan bereketa wî pir heye û yê karibe xwe bighîne tak ji porê wî ,ewê ew bereket têkeve mala wî piştî van gotnan xelk êrîşî mele kirin her yek dixwaze têlek ji por û riya wî bibe bi vî rengî xelkê mele bê por û rih hiştin û mele firtî firtî ji nav destê wan reviya û hew vegeriya wê mizgeftê lê Şêxmûs şûna wî vala nehişt û ew bû melayê wê mizgeftê.



Terya kûçık

Dıbêjın lı gundekî jı gundên kobanê carekê hınek zılam lı dervey mala rûnıştîbûn ,awana jî jı du êla bûn. Ketıbûn şêwrê û dan û stendınê dema kûçıkek jı ber wan derbasbû.

Lı xwe haybûn kevır avêtın kûçık û bera wî dan .

kûçık jî jı ber kevıran revıya û dîwarek ax hate pêşîya wî hema xwe lı ser dîwêr çenkır û çû,zılamekî got :we dî ew kûçık jı tırsa çawa revıya xwe çenkır heta terya wî neghışt dîwêr [Raste dıbêjın tırs mêrga rêvîye] Zılamekî dın lê vegerand û got:kê jı tere got terîya wî neghışt dîwêr,mın bı çavê xwe dît dema terya wî lı dîwêr ket .

yên dın got ma qey ez derewa dıkım ez jı tere dıbêm neghışt dîwêr.
Yê dîtır got :na haşa qey ez derewa dıkım ,ez jî dıbêm gıhşt dîwêr.

Gıhışt û neghışt ……. Qerebalıxek mezın dı nav bera wande çêbû û her êlekê xwe dane alî û dest bı pevçûn û xebera bû. Yek jı vır ....û yek jı wır mersele germbû gıya rakırna destan û lı hev xıstın xeber gıhışt xelkê gund her kes dı alıyê xwede hat alî êla xwe.

Mersele hîn gıran bû û bêtır germbû.....dest bı teqîna çekan û sîlahan bû , yek jı vır hate kuştın û yek jı wır hate kuştın ta gîha heft heyşt kesan jı nûv re ASAYÎŞ hat û wan topî ser hev kırın û bırın zındanê ,pıştî dadgeh dı der heqê wande bıryara zındanê bırî .

her yek bîst...bîst û pênc salan wê dı zındanêde bımîne û her dû êl bûn dıjmınên hev..... wılo ma ta kesên dı zındanê de derketın ...xelk...êl...ketın nav bera wan û wan lı hev anîn,û rojekê dîs lı derve rûnıştîbûn (herdû êl) yekî go bı rastî em berazan dînın me hewqas kes jı hev kuştın û hewqas ketın zîndanê jı bo terya kûçıkekê yekî lê vegerand:erê welah em bê aqılın [nehla lı çavê şêtên bê] bes hûn zanın anha tıştê çû...çû bes bı rastî jî terya kûçık negîha dîwêr yekî lê

vegerand :law çawa neghışt ma qey ez rûnıştîbûm û mın dît
yên .dın got :hema bı xwedê gîha , dîsa.....
Ezê talıya çîrokê jı were bıhêlım ,gelo talî çawa kırın ....û ezê pırsekê jî bıpırsım lê bela dı orta mın û we debe((gelo terya kûçık gıhışt dîwêr yan na)).



www.DEVKUP.com